https://www.al-feqh.com/ha

https://www.al-feqh.com/ha

Ji lewma wê ev qerar daye:

“Di wan şirketên ku di wan de gellek pişkdar hene, di tetbîqkirina van hukman de li tevahîya kar û qezenca şirketan nayê meyzandin; lêbelê li vî esasî dinêre ku her şirîkek pişka wî, wî elaqedar dike.”

- Di vê rewşê de divê rêvebirîya şirketê wan pişkên ku di wan de zekat ne wacib e, ji serê malê xwe bixe, wekî pişka weqfa xêrxwazî û pişkên alîyên xêrxwazî û eslên malên xwe yên sabit, ewên ku di wan de zekat nîn e, her wekî avahîyan, kargehan, kel û pelan û erebeyên ku ji bo bikaranînê û yên wekî wan in, ew malên mewcûdên ku zekat li wan nakeve.

Lêbelê dema rêvebirîya şirketê bi derxistina zekatê ranebe, divê pişkdarên şirketê bi xwe zekata pişka xwe derxînin.

Ew jî wiha çêdibe:

1. Pişkên şirketên çandinî, zekata wan tê derxistin her wekî zekata çandinî û fêkîyan.

2. Pişkên şirketên bazirganî, zekata xwe ji esl û karê pev re derdixin. Têde pişk bi bihayê xwe yê bazarê yên di roja wacibbûna zekatê de tên nirxandin.

3. Pişkên şirketên pîşesazî, zekata xwe ji karê xwe yê safî derdixin; ne ji hazirkirî, avahî û yên wekî wan:

4. Dema pişkdar pişka xwe di nav salê de bifiroşe, ew bihayê wan dixe nav malê xwe û dema sala zekata wî were, ewê pê re zekata wan jî bide. Herçî kiryar e, ew jî zekata pişka xwe wekî bûrî dide. (Qedaya fiqhîye mûasere Dr. Selah es-Sawî, rûpel, 54 û yên piştî wê.)